Newroz Hejmar (73) Rûpel (16) Nîsan 2006z – 2619k

Çavsoriya Rêjîma Turkan

Imbretoriya Osmanî, di şerê Belqan de, pir zeviyên dagîkirine ji dest çûn. Lewre, ji bo pirsa Ermen û Kurdan di Tirkiyê de, bi hovîtî serhildanên wan herdu miletan hilweşandin û bi hezaran gund û bajarok wêrankirin.

Rêjîma Kemalîzmê , hîn di wî xwenîde ye ku, imbretoriya Osmanî vegerîne û zevîyên hevsiyên xwe dagîr bike. Loma jî, di sala 1973 an de, rêjîma Turkiyê bi mebesta parastina hemwelatiyên Turk li Qubrisê, bi hêzên leşkerî, beşek ji Qubrisê dagîrkir û Qubris kire du beş.

Piştî rûxandina destlata hovê hreî bi van û deng, di Rojhilata Nanavî de, bi alîkariya hêzê hevbend, di Nîsana 2004 an de , destlatên derdora Iraqê û bi taybetî, destlata Tirkan. Carina bi mebesta hebûna gerîleyên PKK û carina bi mebesta parastina hemwelatiyên Turkumen li Kerkûkê her dere cav sor dibe û rûyê xwe yê ne mirovane û demoqrat ji bo azadkirina beşê Kurdistana Iraqê dide xuyan.

Rastiya herî berçav ew e ku, daxwaza destlata Tirk, hilweşndina hukumeta Kurdistanê û dagîrkirina Kerkûkê ye. Ji ber gava xala 140, ji destura Iraqê pêk were, wê gavê, Kerkûk dikeve çarçewa Kirdistana Iraqê. Ev bi xwe tirseke mezin dixe nava destlata Tirk. Ji ber wê jî, ceneral, serokwezîr û şalyarê derve yên Tirkiyê gefguran didin herêma Kurdistana Iraqê. Lê, serokê herêma Kurdistaê birêz Mesûd Berzanî, bi hişmend û mêranê, bersiva destlata Turkiyê daye. Ew bersiv bûye cihê vehesa hemî Kurdan. Lewre, hemî hêz, kurdperwer, rewşenbîr û dezgehên Kurd bûne piştevan ji herêma Kurdistana Îraqê re.

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de